

kuDik

kovara zarokan - kurdiska barntidning



sal: 1997

hejmar: 49

kulilk

kovara zarokan - kurdiska barntidning

XWEDÎ

Mala Kultura Kurdî & Jîna Nû

REDAKTOR

Zinar Soran

REDAKSIYON

H. Balta

L. Polat

M. Dehsîwar

M. Lewendî

ABONETIYA SALÊ

Şexs 150 SEK

Institution 200 SEK

hejmarek 20 SEK

*Ji bo welatên din mesrefa
postê lê zêde dibe.*

İLAN

Rûpelek 500 SEK

Nîv rûpel 250 SEK

POSTGIRO

503799-9

ISSN

ADRES

KULILK

Box: 152 16

161 15 Bromma/ Sweden

TEL/ FAX

46-8-8031357/ 8-801825

Hejmara pêşî ya Kulîlkê di sala 1980-yî de hatîye weşandin.

sal: 1997



hejmar: 49

Heval û hogirên hêja!

Weke zarokên her neteweyî, mafê zarokên kurdan jî heye ku bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Ev mafekî xwezayî ye. Lê mixabin, dijminên kurdan vê kês û fir-sendê nadin zarokên me. Weke piraniya neteweyên din dewleteke me tuneye. Dibistanê kurdî tunene. Zarokên kurdan neçar dimînin ku bi zimanên tirkî, farisî û erebî bixwînin. Ew nikarin bi awakî azad, weke piraniya zarokên cîhanê bi tahm û lezeta zimanê xwe çîrok û metelok-kên xwe bixwînin. Ji ber vê siyasetê, gelek zarokên kurdan zimanê xwe yê zîkmakî ya ji bîr kirine ya jî nizanin.

Lê em nikarin vê yekê qebûl bikin. Heta ji destêne me bê, em dê bi zimanê xwe yê şêrîn û delal bixwînin û binivîsin. Kulîlk di vî warî de hewldanek e. Bê guman ev hewldana me bê piştigirî û alîkariya xwendevanan wê jar û hejar bimîne. Ji ber vê yekê, divê hûn li Kulîka xwe xwedî derkevin; divê malê kurdan, zarokên kurdan bê Kulîlk nemînin. Divê hûn Kulîlkê bi çîrok, nivîs, pêkenîn, rojbûn, serpêhatî, wêne û karîkaturên xwe bixemilînin; Kulîkê roj bi roj geştir û xweşiktir bikin.

Di hejmara 48an de, ji ber şaşıya çapxaneyê cihênen ren-gên Alaya Kurdistanê yên kesk û sor bi hevdu hatibûn guherandin. Ji ber vê kîmasiyê em doza lêborînê dikin û Alaya Neteweyî careke din çap dikin.

Heta hejmareke din, hemû şahî û xweşiyênu ku hene yên we bin.


KULÎLK

PÎRÊ Û DÎK

Amadekar: Bavê Hêvi

Hebû Pîrek û hebû dîkek. Diranên pîrê ketibûn, tenê du diranên wê mabûn. Ji wê re digotin Pîra Dudiran. Pîrê dahn dikuta. Dîk nikilek li dahnê pîrê xist. Pîrê mîrkutê xwe avêt dîk. Mîrkut li çavê dîk ket, çavê dîk rijiya. Dîk got:

- Ezê herim Huristan, Muristan. Bînim eskerkî giran, ser Pîra Dudiran. Ji bo hebek dahn, çavê min rijand.



Dîko haziriya xwe kir û kete rê. Dîk çû, çû, çû marek dît.
Mar ji dîk pîrsî:

- Dîk ma tu li çi degerî?

Dîk got:

- Dîk û quzilqurt!



Mar got:

- Ma ez bêjim çi?

Dîk got:

- Bêje apê dîk, çek spî, tifing li pî, ma tu li ci digerî? *Ebz*

Mar got:

- Apê dîk, çek spî, tifing li pî, ma tu li ci digerî? *Ebz*

Dîk got:

- Ezê herim Huristan, Muristan; bînim eskerkî giran, ser

Pîra Dudiran; ji bo hebek dahn, çavê min rijand.

Mar got:

- Ez jî hevalê te û dixwazim bi te re werim.

Dîk û mar ketin rê; çûn, çûn, çûn li dûpişkekê rast hatin.

Dûpişkê ji dîk re got:

- Dîk ma tu li ci digerî?

Dîk got:

- Dîk û quzilqurt!

Dûpişkê got:

- Ma ez bêjim çi?

Dîk got:

- Bêje apê dîk, çek spî, tifing li pî, ma tu li ci digerî? Dû-


pişkê got:

- Apê dîk, çek spî, tifing li pî, ma tu li ci digerî?

Dîk got:

- Ezê herim Huristan, Muristan; bînim eskerkî giran, ser

Pîra Dudiran; ji bo hebek dahn, çavê min rijand.



Dûpişkê got:

- Ez jî hevalê te û dixwazim bi te re werim.

Dîk, mar û dûpişk ketin rê çûn, çûn, çûn li gundorekî rast hatin.

Gundor ji dîk re got:



- Dîk ma tu li çi digerî?


Dîk got:

- Dîk û quzilqurt!

Gundor got:

- Ma ez bêjim çi?

Dîk got:



- Bêje apê dîk, çek spî, tifing li pî, ma tu li çi digerî?

Gundor got:

- Apê dîk, çek spî, tifing li pî, ma tu li çi digerî?

Dîk got:

- Ezê herim Huristan, Muristan; bînim eskerkî giran, ser Pîra Dudiran; ji bo hebek dahn, çavê min rijand.

Gundor got:

- Ez jî hevalê te û dixwazim bi te re werim.

Dîk, mar, dûpişk û gundor ketin rê çûn, çûn, çûn li tepi-

keke rêxê rast hatin.

Tepika rêxê ji dîk re got:

- Dîk, ma tu li çi digerî?

Dîk got:

- Dîk û quzilqurt!

Tepika rêxê got:

- Ma ez bêjim çi?

Dîk got:

- Bêje apê dîk, çek spî, tifing li pî, ma tu li çi digerî?

Tepika rêxê got:

- Apê dîk, çek spî, tifing li pî, ma tu li çi digerî?

Dîk got:

- Ezê herim Huristan, Muristan; bînim eskerkî giran, ser

Pîra Dudiran; ji bo hebek dahn, çavê min rijand.

Tepika rêxê got:

- Ez jî hevalê te û dixwazim bi te re werim.

Dîk, mar, dûpişk, gundor û tepika rêxê hatin mala pîrê.

Dîk çû ser sergo, li hevalên xwe dinerî, ka ew ê çi bînin serê pîrê. Tepika rêxê ket tifikê. Mar xwe li stûna nav malê gerand. Dûpişk ket nav nivînê pîrê.

Dinya sar bû. Pîrê ji derve hat hundur. Destên wê cemidî bûn. Ji bo destêن xwe germ bike, destêن xwe xist tifikê. Destên wê ketin nav tepika rêxê. Pîrê xwest destê xwe bi stûnê paqij bike, mar pê veda. Pîrê ta girt; çû ket nav nivîna, dûpişkê pê veda. Pîrê xwest derkeve derve û bike gazî. Gava derket derve, gundor bi ser serê wê de ket. Pîrê di binê gundor de pelixî û mir.

Dîk bi vî awayî heyfa xwe ji pîrê hilanî.

Çiroka me li cara, rahmet li dê û bavêñ guhdaran.

KANÊ BERANEK

-Kanê beranek, kanê beranek?

-Va me ez, va me ez

-Tu çawayî iro?

-Gelek baş im iro

-Zû ji vir her!

Zû ji vir her!

-Kanê şehade, kanê şehade?

-Va me ez, va me ez

-Tu çawayî iro?

-Gelek baş im iro

-Zû ji vir her!

Zû ji vir her!

-Kanê sertilî, kanê sertilî?

-Va me ez, va me ez

-Tu çawayî iro?

-Gelek baş im iro

-Zû ji vir her!

Zû ji vir her!

-Kanê belîcan, kanê belîcan?

-Va me ez, va me ez


-Tu çawayî iro?

-Gelek baş im iro

-Zû ji vir her!

Zû ji vir her!
-Kanê qilîcan, kanê qilîcan?
-Va me ez, va me ez
-Tu çawayî îro?
-Gelek başim îro
-Zû ji vir her!
Zû ji vir her!

-Kanê malbat, kanê malbat?
-Va ne em, va ne em
-Hun çawan in îro?
-Gelek baş in îro
-Li vir bimîn!
Li vir bimîn!



(Ev stran ji Swêdî - "Var är tummen" - hatiye girtin û adapteyî
Kurdî bûye)

Werger û adaptasyon:
M. Lewendî û Boniye Cegerxwîn

PIXCOYÊ ŞEMÛZ

Pixco zarokekî 12 salî bû. Ew pirr şemûz û derewker bû. Kesên ku wî dinasîn, hay ji xerabî û xisarokiya wî hebûn û xwe jê diparastin. Ji ber wê jî kesî ji gotinêñ wî bawer nedîkir û guh ne didan wî û peyvêñ wî.

Lê belê Pixco pirr jîr bû, bi zimanê xwe yî xweş û hostetiya derewêñ xwe gelek kes dixapand û ew didan bawerkin. rin.

Çîroka Pixco pirr dirêj e û şaxêñ wê jî gelek in. Lê em dê vê çîroka pêkenî û her wiha dramatîk û balkêş ji xwendevanêñ xwe re bi şeklekî kurtkirî û ji besêñ cuda, lê li pey hev pêşkêş bikin.

Pixco û paleyêñ bavê wî

Paleyêñ bavê Pixco hê nû ji palehiyê vege riyabûn. Diya wî şîva wan amade kiribû û Pixco û bavê xwe jî ji hêlekê ve li ber paleyêñ westiyayî xwarinê rast dikirin û ji hêlekê ve jî bavê wî bi wan re dipeyivî.

Piştî şîvê û şevbuhêrkê herkes çû ser cihê xwe da ku razên. Berî ku di xew re herin, Pixco çû odeya mîvanan û ji paleyêñ bavê xwe re bi zimanekî xweş û bi dengekî nizim wiha got:

- Gelî paleyan, berî ku hûn têkevin xewê, ez dixwazim bi we bidim zanîn ku ger kes di vê malê de bi xwe de birî wê bapîrê min bimre û ger bimîze wê dapîra min bimire. Ji bo wê jî hay ji xwe hebin. Ger bavê min pê bihese ku hûn bûne sebebê tiştekî weha, bira Xwedê bizanibe ku dê çi were serê we!

Mêvan li ser van gotinêñ wî heyirî mabûn, lê zêde jî guh nedabûn peyvên wî. Wê çawa zilamêñ mezin û qerase bi xwe de birîn û bimîzin! Paleyêñ westiyayî bi vê baweriyê zû ketin xeweke giran.

Derengê şevê Pixco şorbenîska ku ji ber şîvê mabû, xiste firaqekê û tevî misînek av bi dizî derbasî odeya mîvanan bû. Yek bi yek lihêfîn wan ji ser wan da alî û her kesê çemçikek şorbe berda nav pêcameyêñ wan. Gava şorbe xelas bû, av bi ser doşekêñ wan ve berda. Paleyêñ westiyayî ku ketibûn xeweke giran, qet bi xwe ne hisiyan. Pixco bi kêfa ku wezîfeya xwe bi serfirazî pêk anîbû, ji odayê weke bayê bezê derket û çû ser cihê xwe.

Berê şeveqê yek ji paleyan ji xew şiyar bû ku here li derva avekê birêje. Çaxê lihêfî ji ser xwe avêt ku rabe piya, pê hisiya kû nav şeqêñ wî şil bû. Bi tirs fitîla lembeya pêxistî geş kir û li xwe û nav livînêñ xwe mîze kir. Ji tirsâ rûyê wî sipî bû; lerz kete laşê wî û lal ma.

Bi tirs yê kêleka xwe ji xew şiyar kir. Lê gotin ji devê wî dernediketin. Hevalê wî bi çavêñ heyirî pêşî li dora xwe mîze kir û pişt re dîsa li hevalê xwe yî hişyar nihêrt:

-Çi ye, te çîma ez ji xew şiyar kirim?

Yê pêşî bi peyvên tevlîhev ew bersivand:

-Ka zû rabe kuro! Ka tu jî li nav cîhê xwe mîzeke, te jî bi xwe de nekiriye?

-Tu çi dibêjî kuro; tu dîn bûyî?

Bi van gotinan re, destê wî kete ser doşeka şil. Mahd û mirûzê wî tirş bû, xwîdaneke sar di eniya wî de avêt û den-gê wî qusiya. Çaxê hişê wî hate serê wî, zû rabû piya û cilêñ xwe li xwe kir. Û pê re jî deng li hevalêñ xwe yêñ din kir:

-De zû rabin. Em zû ji vir bi dûr kevin, beriya ku tiştek bi serê me de nehatiye!

Paleyên din jî ji xewa giran şiyar bûn û bi meraq li dora xwe nihêrtin. Çaxê ku tev bi rewşê hisiyan, zû ji nav cihêن xwe derketin û bi lez cilêن xwe li xwe kirin.

Li halê hev nihêrtin û hê bêtir tirsîyan. Tevan li hev dini-hêrtin; kê bi xwe de çi kiribû, eşkere bûbû. Tevî ku şal jî li xwe kiribûn, dîsa jî aliyekî wan şil mabû. Girîn ji halê wan kêm bû. Yê ku pêşî bi xwe hisiyabû, ji hevalên xwe re bi dengekî nizim wiha digot:

Rebenê bapîr ne bes bû, me dapîr jî bi ser ve qurban kir! De rabin em zû ji vir derkevin hê ku Mîrza beg pê nehisiyaye û bi ser me de negirtiye. Niha dê û bavêن wî mirine û ger bi vê kelewacê bi ser me de bigire, yek ji me ji des-têن wî nafilite!


Bi lez derî vekirin û bi dorê xwe ji hundir avêtin derva. Weke ku hinek bidin pey wan, bêyî ku li dora xwe û li pey xwe binihêrin, ji malê bidûrkentin.

Mîrzayê bavê Pixco bi çuyina paleyan şaş mabû. Ci bi halên wan hatibû gelo? Çima wisa tev bi hev re dabûn rê û wenda bûbûn? Bi van pirsan çû navmalê ku li Pixco bipir-se; lê ew jî ne di nav nivînêن xwe de bû. Wê gavê fêm kir ku ev tişt ji bin serê wî derketibû; lê fêm nekir bê bi çi ar-mancê wisa kiribû.

Vê nîvê havînê bê pale mabû û nizanibû ku wê çawa zâdê xwe rakin. Niha tu paleyên vala jî nemabûn; wê kê alî-kariya wan bikira? Bi van fikran derket derva û da pey şopa Pixco. Lê Pixco ji zû ve wenda bûbû; mîna bayê, tu şop li pey xwe nehiştibû.

Amadekar: Mihemed Dehsiar

Hejmaran yeko yeko bighînin hevdu!



HACÎ QADIRÎ KOYÎ

(1815-1897)

Piştî Ahmedê Xanî (1651-1706) yek ji şâîrên me yên millî Hacî Qadirî Koyî ye. Ew di 1815an de, li Kurdistanâ Îraqê, nêzî bajarê Koye, li gundê Gorqerecê hatîye dunyayê. Navê bavê wî Mela Ahmedê Mela Salihê Mela Ahmedê Gewre ye. Navê Dîya wî jî Fatê ye. Hacî Qadir derheqê dê û bavê xwe de di helbesteke xwe de weha dibêje:

*Bawkim Ahmed bû nawî fikrim dê,
Xelqî ladê bû, daykî min Fatê.*



*(Bavê min Ahmed bû navê wî, tê bîra min
Xelkê gunda bû diya min Fatê.)*

Hacî Qadir hê biçûk e bavê wî dimire. Dîya wî, wî di-de ber destê Mela Ahmedê Gunbetî da ku bixwîne. Lê Hacî Qadir dibe neh salî dîya wî jî dimire. Mela Ahmed, Hacî Qadir digre cem xwe wî dide xwendin. Paşê Hacî Qadir diçe bajarê Koye, li wir dixwîne. Piştre wek feqî an jî wek mela li Koye, Xoşnav, Serdeş, Mehabad, Ker-kuk, Suleymaniye, Hewlêr û gelek bajarên Kurdistanê di-gere, dixwîne û melatîyê dike.

Wek şâîrên Kurd, hevdemên wî Kake Fettah, Keyfi û Şêx Rezayê Talabani ne. Lê bi qasî ku tê gotin navbera wî û Şêx Reza ne baş bûye.

Piştî salên 1850yî Hacî Qadir ji Kurdistanê derdikeve, diçe Îstenbolê. Li Îstenbolê danûstendinên wî bi gelek Kurdan re çêdibe. Bi taybetî piştî ku malbata Bedirxanîyan dinase, Mîr Bedirxan wî wek mamoste ji bo zarokên xwe digre. Hacî Qadir piştî ku dibe mamostê zarokên Mîr Bedirxan, ew bêtir fêrî pirsa Kurdî dibe. Çi li Îstenbolê be, ci xususî li mala Mîr Bedirxan be, rastî gelek tiştan tê. Gelek tiştên nû yên derheqê Kurdan de fêr dibe. Mesela, cara pêşî Mem û Zîn a Ahmedê Xanî li mala Mîr Bedirxan dibîne, wê dixwîne, felsefa Ahmedê Xanî fêm dike. Felsefeya Ahmedê Xanî ya millî gelekî tesîrê li wî jî dike.

Ji hinek helbestê Hacî Qadirî Koyî xuya dike ku ew nezewiciye. Mesela di hel Besteke xwe de ew weha dibêje:

*Her min im êsta warisî Isa
Bê kur û mal û bê jin û mewa.*

Lê ji bo Hacî Qadir kur û mal û jin, welatê wî, milletê wî û bi taybetî helbestên wî ne. Dîsa di rêzekê de ji bo vê yekê jî weha dibêje:

*Ewî şair nebê koreocaxî
Le sayey şî'irekan babî kuran im.*


Li ser tarîxa wefata Hacî Qadirê Koyî jî gelek tarîxên cuda hatine nivîsin. Lê piştî ku rojnama Kurdistan (1898-1902) derket ronahîyê, tarîxa wefata Hacî Qadir jî derket meydanê. Heta salên 1970'yî herkesî wek tarîx ji bo wefata Hacî Qadirî Koyî 1892 dinivîsi. Lê piştre di rojnama Kurdistan (no:3/1898) de Mîqdad Mîthed Bedirxan bi munasebeta çapkirina hel Besteke Hacî Qadir bi kurtî weha dibêje:

“Alimekî Sora hebû, navê wî Avdilqadir bû, par wefat kir (qesta wî 1897 e). Li ser Mem û Zînê bi destê xwe hin beyt nivîsîne....”

Hacî Qadirê Koyî di 1897an de li Îstenbolê wefat di-ke. Gorra wî jî dîsa li Îstenbolê li Goristana Karaca Ahmedê (Karaca Ahmet Mezarlığı) ye.

Amadekar: M. Lewendî

MİJÜLİ



Di rismê jorîn de marek, mışkek, kundek, dizek, şebşebokek,
tivirek, kêrikek û debançeyek hatine veşartin.

Ma hûn dikarin wan bibînin?

CÎHANA ZİMËN

Ziman di nav mirovan de pêwendiyâ herî girîng û mezin e. Bi mîlyaran mirov ji çar aliyê cîhanê bi zimanê xwe yan jî bi zimanekî hevbeş (îngîlîzî, frensî, spanî û hwd) bi hev re diaxifin û xwe îfade dikin. Îro di dinyayê de nêzî 3000 zimanên cuda hene ku ji teref zêdeyî pênc milyar mirovan ve tê axaftin. Zimanê ku herî pirr tê axaftin çînî ye ku hejma-ra wan zêdeyî milyarekê ye. Ji bilî çînî, zimanên din ên res-mî yên Yekîtiya Neteweyan îngîlîzî, frensizî, spanî û rûsi ye.



Tevî ku ziman ji hev cuda ne jî, di eslê xwe de gelek ji wan nêzî hev in û bi hev re di nav malbatêن cuda de cîh

digrin. Weke mînak, malbata zimanêindo-ewrûpî ji van zimanan pêk tê: romî, keltî, grekî, germanî, slavî, iranî û indo-arî.

Kurdî jî dikeve beşa malbata zimanê iranî û weke ku li jorê jî xuya dike, beşek ji zimanêindo-ewrûpi ye. Li gora dîrokzanan, bingehê zimanêindo-ewrûpî nêzî 6000 sal berê li rojhilata başûrê Ewrûpayê yan jî Asyayê hatiye axaftin. Dema ku mirov ji hev belabûn û li cîhêni hev cuda bi-cîhbûn, pêwendiyêwan ji hev qut bûn û piştî demeke dirêj zaravayê (diyalekt) ji hev cuda ava bûn. Ev zarava jî piştî demekê bûn zimanê xweser û her wiha yêneteweyî.

Ger mirov bixwaze hinek zimanan bide ber hev, dê mirov bibîne ku ew ji hev ne gelek dûr in:

<u>Swêdî</u>	<u>Îngîlîzî</u>	<u>Kurdî</u>
bror	brother	bira, birader
stjärna	star	stêr, stêrik
nio	nine	neh
sex	six	şes

Amadekar: Mihemed Dehsîwar


NAVÊ VAN HÊŞİNAHİYAN BİNİVİSİN!




Kurkak




Gezer




İnat



Fasulye




Tulip



Pirinç



.....



Kartop, Patat

ZİMAN Ü GRAMER

Amadekar: Zinar Soran

KÎTE

Bi vebûn û girtina devêne me, dengek derdikeve. Em ji tevayıya wî dengî re, kîte dibêjin. Kîte, ji yek an jî yekê bêtir tîpênu ku bi carêkê ji devê me derdikevin pêk tê.

Mînak:

a, ê, û, ez, tu, rê, ga, erd, per, par, kar, rind, dran, deng, stran û hwd.

BÊJE

Bêje, ji yek an jî pir kiteyan pêk tê û bi serê xwe maneyekê dide.

Mînak:

Hesp, dar, mîvan, golik, tirş, ba, baran û hwd.

HEVOK

Ji yek an jî çend bêjeyan pêk tê. Maneyekê, fikrekê, daxwazekê, rewşekê, pêwîstiyekê, karekî û hwd. diyar dike. Hevok bi niqteyekê dawî tê.

Mînak:

*Îro baran bariya. Xaniyê me dilop dikir.
Silo digrî. Rizgo dikene. Xezalê dilîze.*

NIQTE (.)

Niqte, îşareta paşıya hevokê nîşan dide. Gava hevok dawî were, niqteyek li dawiya wê tê danîn.

Mînak:

Ez êvaran zû têm malê. Bavê min xerat e. Dilşa mîvana me ye.

BÎHNOK (,)

Bîhnok, di hevokê de dikeve nav navêñ kes û tiştên li dû hev rêzkirî û bêjeyêñ li pê hevdu têñ ku bi pevgirêkekê bi hevdu nehatine girêdan.

Mînak:

Lezgîn, Gurgîn, Şêrîn û Evîn hevalêñ hevdu ne.

Di kirasê Mizgînê de rengêñ kesk, sor, zer û spî hene.

Mêranî, comerdî, rastî, mirovperwerî û dilpakî nîşanêñ mirovêñ qenc in.

NIQTEPIRS (?)

Niqtepirs li paşıya hevokêñ pirsê tê danîn. Hevoka piştî niqtepirsê, bi tîpêñ mezin tê nivîsandin.

Mînak:

Berhemê çi xwarin xwar?

Ma gundê we dûrî bajêr e?

Tu ji kîjan welatî yî?

NIQTECOT (:)

Gava li dawiya hevokê tiştên din bêne zêde kirin,
yan hejmartin, niqtecot li dawiya hevokê tê danîn.

Mînak:

*Ji bona hînbûna zimanekî biyanî, pêwîstî bi sê tiştên
bingehîn hene: Xwendin, nivîsandin û axaftin.*

*Diya Lezgîn ji wî re digot: "Kurê min, zû here mala
xalê xwe û ji me re hinek pîvaz bîne."*

NIQTEBÎHNOK (;)

Niqtebihnok dikeve navbera hevokên ku bi hev re
girêdayî ne, mana hev temam dikin û wê dibin serî.

Mînak:

Havîna Kurdistana ne bi şili ye; lê germ e.

*Zivistanan berf li beriyê zêde nabare; lê baran pirr
dibare.*

NIQTEBANG (!)

Niqtebang li dawiya bêje û hevokên balkışaniyê tê
danîn.

Mînak:

Birano! Ax! Way li min bavo! Hawarê!

Bes bigri! Were vir! Lezgîn bilezîne!

TİŞTEKÎ MİN HEYE TİŞTANOK

1-Tıştekî min heye;
Sibê bi çar lingan e.
Nîvro bi du lingan e.
Êvarê bi sê lingan e.
Ew ci ye?

Bersîv:

2- Tiştekî min heye;
Bûzê dişkînim, zîv derdikeve.
Zîv dişkînim, zêr derdikeve.
Ew ci ye?

Bersîv:

3- Tiştekî min heye;
Hesin, bizin
Gayê mezin
Tev dilîzin
Tev dibezin.
Ew ci ye?

Bersîv:

HÛN PÊ DİZANİN?

Amadekar: Bavê Hêvî

Pirs 1: Pêşî hêk çêbûye ya jî mirîşk?

Ev pirseke kevnare ye. Gelek caran zarok û mezinan ev pirs ji hevdu pir-sîne. Lê di vî warî de bersîveke misoger û zelal ne-hatiye dayin.

Em careke din bi dû bersîva vê pirsê ketin. Me li gor lêkolîna xwe bersî-veke munasib dît.




Ka hûn jî li ser vê pirsê mijûl bibin. Li gor we, pêşî hêk çêbûye ya jî mirîşk?

Pirs2: Xunavê kar dike ya jî dixesire?

Xaltîka Xunavê dihere sûkê. Ew ji misîn û cezweyê qahwê yên kevn pirr hez dike û wan dide hev.

Ew du misînan dikire. Piştî wê, ew cezweyekî qahwê yê gellekî xweşik dibîne. Lê perê wê têrê na-ke ku wî cezweyê pirr xweşik bikire. Ew her mi-sinekî xwe bi 600 baqno-tan difroşe.



Ew ji misînê pêşî % 20 qezenc dike û ji yê dudan jî % 20î zerar dike.

Gelo li gor vî hesabî, xaltîka Xunavê çiqasî kar dike ya jî dixesire?

Pirs3: Wan dims çawa li hevdu par ve kiran?



Sê şivan qewlê xwe li cem xwediye pez dikin. Li gor bazara wan, wê xwediye pez 21 kûp dims bida hersiyan. Gava qewlê wan diqede, xwediye pez 21 kûpan dide wan. Piştî ew ji nav gund derketin, lê hay dibin ku ew hatine xapandin. 7 kûp tije dims bûn. 7 kûp nîvçe bûn û 7 kûp jî vala bûn. Ew dimsa xwe weke hevdu li hev par dikin. Gelo çawa?


Pirs 4: Mirov dikare di nav sê rojan de bibe 18 salî?

Xortek ji hevalên xwe re dibêje: "Ez do 15 salî bûm û sala bê jî ezê bibim 18 salî".


Hevalên wî pêşî bawer nakin. Lê piştî ravekirina xort, hevalê wî bawer dikin. Ma hûn dizanin çawa?

Bersîva Pirsan: Ger hûn bersîva van pirsan nizanibin, hûn dikarin li rûpelaan binerin.


NAVÊ VAN HEYWANAN BINIVISİN!




Galek




Galek




Berçil



Cahenk



Mirışk



Gecik

DÛRİKÊN ZAROKAN

Amadekar: Emîn Narozî

Pirpizêk kulîlkeke baharê ya rengzer î pitpitî ye, ew li hinek hêlên Kurdistanê yên germ û li gor rewşa hawayê di meha sibatê de çêdibe. Mîna pîvokê ew jî wek nîşana biharê tê nasîn. Herweha ew nîşana zayina pez e jî û bi pirranî heyaxelasiya meha adarê dimîne.

Ji ber vê yekê jî dema zarûk li çolê wê dibînin dicin, vê dûrikê jê re dibêjin û piştre wê dixwin:

*Perpizê karik bizê
Yeke min yeke Hemzê
Ya Hemzê kete çalê
Ya min ma dotira salê*

Ev dûrikên jêrî jî gava ku zarûk hev dijmérin bê ka bîst yan jî çîtik li kê dikeve têngotin. Car-na jî dema zarûk dest bi leyiztikê dikin hingê du heb xwe ji hev dûr dikin û piyo piyo ber bi hev ve dicin, dibêjin:

Biz didim, ba didim, derî li te radidim .

Yan jî hev bi van dûrikên xwarî dijmêrin bê
ka dawî li ser kê dimîne:

1.

Yek dido
Bawer sisê
Çeqla fisê
Mamo zîno
Çav hêşîno
Simbelboqo
Çavziroqo
Xwe li tatê xist
Di cî de mir.

2.

Yekê yekanekê
Dubiskanê
Ezîzanê
Kezîpanê
Gula çepo
Çepil mijo
Aragijo
Totileynê
Şam û şeyn ê
Dest hineyê
Bîst li te yê

BERSÎVÊN PİRSAN

Bersîv 1:

Di nav demeke dûr û dîrêj de,
 "Mirîşk" ji guherandin û pêşketina
 cinsekî marmarokekê çêbûye
 ku carekê hêkek kiriye. Ev hêk
 bûye mirîşk. Yanê, hêk pêşî çê-
 bûye.

Bersîv 2:

Li gor vî hesabî; cezweyek bi
 500 û yê din jî bi 750 banqnotî
 hatibûn kirîn. Yanê wê herdu
 cezweyan bi 1250 banqnotan ki-
 rîbûn û bi 1200 banqnotan jî fi-
 rotibû. Bi vî awayî wê 50 banq-
 not zerar kiriye.

Bersîv 3:

Şivanek 3 kûpêñ tije û kûpekî
 nîvtije dibe. Herdu şivanêñ din,
 her yek 2 kûpêñ tije û 3 kûpêñ
 vala dibin.

Bersîv 4:

Xort di 31ê çileya pêşîn de ha-
 tibû dunyayê û di 1ê çileya paşîn
 de ev gotin digot.

Bersîvêñ Tiştanokan:

1. Mirov
2. Hêk
3. Sol û mirov

PÊKENÎN

Amadekar: Lokman Polat

ÇAKÊT Û KURTAN

Melayê Meşhûr li kerê xwe
 swar dibe, wê here êş. Bi rê de
 destava wî tê. Çakêtê xwe da-
 vê ser pişta kerê û li paş devi-
 yekê dimîze. Gava tê cem kerê
 xwe, dibîne ku çakêtî wî tune-
 ye. Hineka çakêtê wî diziye.

Ew jî kurtanê kerê ji ser piş-
 ta kerê datîne û ji kerê xwe re
 dibêje:

- Heta çakêtê min neyê, ez jî
 kurtan nadim te.

HEVSARÊ KERÊ

Rojekê hefsarê kerê Melayê
 Meşhûr tê dizîn. Mele çiqasî
 dipirse jî, kes xwe lê nake
 xwedî. Pişti demekê Mele dibî-
 ne hefsarê kerê wî di histuyê
 kerekî din de ye. Mele dibêje:

-Hela hela! Ev hevsar yê ke-
 rê min e; lê laşê wî çima weha
 hatiye guherandin?

X A Ç E P İ R S

1



	2	P	I	R	E
3	B	i	R	E	K
		N			



	4	P	E	N	S	E
5	M	i	S	P	K	
		N				



6	K	U	L	I		
7	K	E	V	J	A	L



KÎ DÎZANE?

Amadekar: Heqqî Xoce

- 1) Kîjan pel hîç mezin û gir nabe?
- 2) Li ku derê roja ïnîyê berî roja pêncsemê tê?
- 3) Ger lîmon têkeve nav avê çi dibe?
- 4) Xwediyyê bexçe pêşî çi davê nav bexçeyê xwe?
- 5) Dizê ku dikeve malê, çi nadize?
- 6) Tiştê ku mirov nikare bi lingên rastê lêbixe çiye?
- 7) Çend pirtûk dikeve centeyekî vala?
- 8) Sê jinik û mîrikek wê herin seyranê. Kîjan ji wan wê erebeyê bajo?

Bersîv:

- 1) Pela pirtûkê.
- 2) Di ferhengê de.
- 3) Şil dibe.
- 4) Lingê xwe davêje.
- 5) Zîla derî.
- 6) Lingê rastê
- 7) Pirtûkek dikeve. Piştî pirtûkekê êdî çente ne vala ye.
- 8) Kesê ya jî kesa ku ehliyeta wî/ wê heye.

FERHENGOK

dahn: Genimê kelandî.

gundo, lox: Kevirekî dirêj û grover yê ji bo ser xaniya bidewisine.

gazî, hawar: Bangkirina ji bo alîkariyê.

tîfîk, argûn, kuçîk: Cihê ku mirov agir tê dedadide
dûpişk, dolpi: Heywanekî bi jar e; bi mirov vedide. Aqreb.

şâîr, helbestvan: Kesên helbestan dinivîsin.

feqe: Şagirtin li cem şêx û melan dixwînin.

hevdem, hevçax: Yêñ di çax û demekê de.

danûstendin: Pêwendî, têkilî, eleqe.

fêr bûn: Hîn bûn, hewisîn, ho bûn.

taybetî: Xusûsî.

millî: Neteweyî.

kitêb: Pirtûk.

goristan: Mezel; cihê ku mirî lê tê veşartin.

girîng: Muhîm.

cuda: Cihê, ne weke hevdu.

malbat: Dê, bav û zarok. Famîlye.

zarava: Cureyên zimanekî; diyalekt.

dîrokzan: Kesê ku zaneyêñ dîrokê ye; pisporê dîrokê.

xweser: Serbixwe, bi serê xwe.

hefsar: Werîsê ku mirov dixe stuyêñ heywanan.

kurtan: Cila ku davêñ ser pişta keran; palan.

şal: Şelwer, pantolon.

pale: Xebatkarê paleyê.

firaq: Firax.



ALA RENGÎN

Ala rengîn pîroz be xweş
Te hilgirim diçim bi meş
Tu li ser milên xortêñ ciwan
Di nav te de yek rojek geş

Kesk û sor û zer î
Sipî û gewher î
Nîşana zafer î
Ey xortêñ kurdan!
Silavê lê bikin!

CEGERXWÎN